

Serokê DTP Xelata Zimên Werdigre

Amedekar: Hesenê Cumî

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di 18'ê Nîsana 1992'an de ji aliyê komek rewşenbîrên Kurd ve hate avakirin. Enstîtî ji bo salvegera avakirina xwe û ji bo dayîna **Xelata Zimên** a **Feqî Huseynî Sagniç** li navenda çanda Mecidiyekoy merasimeke li dar xist. Xelata îsal ji ber axaftina Hevserokê DTP'ê Ehmet Turk ya bi kurdî a di meclisê de. Turk xelata xwe ji destê jina Feqî Huseynî Sagniç girt.

Di axaftina destpêkê de, Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Samî Tan qala avakirina Enstîtuyê kir, da zanîn ku di sala 92an de dema enstîtî hatiye avakirin, yekemîn serokê Enstîtuyê Musa Anter hatiye kuştin. Lê, di gel hemû zor û zordariyan, wan xebata xwe pêş xistiye, ferhenga mezin amade kiriye, ferhengên biwêjan derxistine û her wiha gelek berhemên din.

Tan got ku TRT 6 bi kurdî weşanê dike, lê dewlet hê saziyeke ku bi kurdî li ser kurdî xebatê dike nas nake û ev yek lê zêde kir: "Ji me dipirsin 'hûn çima TRT 6ê qebûl nakin?'. Niha tenê li Stenbolê zêdeyî 20 cihan Kursên zimên em didin. Li Tirkîyê, li gelek bajaran kursên me didomin. Mamosteyên me hene. Van nabînin diçin li Başûr, li Ewropayê li kurdîzanan digerin. ta me nepejîrîn, çima em TRT 6ê bipejîrîn." "Kurdî weşanê dikin lê Komeleya Tealî Cemiyetî wekî komeleye xirab bi nav dikin. Di weşana xwe de alfabeya Celadet Elî Bedirxan bikar tînin lê wî nabînin. Li Amedê pirtûkxana Mehmed Uzun nabînin lê, nizamî diçin çî dibînin?. Niha jî êrişan dikin. Emê li hemberî êrişan serê xwe netewînin."

Serokê Enstîtuyê Tan bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Ev ziman zimanê me ye, ev çand çanda me ye, em xwedî vî zimanî ne û emê xwedî lê derên jî."

Piştî wergirtana xelatê, birêz Turk weha dibêje: "Ez vê xelatê li ser navê şehîd û rewşenbîrên Kurdan digirim. Îro em ji bo

demokrasiyê û pirsgirêka Kurd têkoşînê didin. Lê dewlet êrişan tîne ser me. ta îro gelê Kurd li ber van êrişan serê xwe netewandiye, ji îro pê ve jî gelê Kurd li hemberî kuştin, girtinan serê xwe natewîne.

Em biratî dixwazin, em wisa dixwazin pirsgirêkê çareser bikin lê, ger hûn bi zordarî bîn ser gelê Kurd jî, dê gelê Kurd winda neke, hûn winda bibin.

Ta îro li ser zimên û çanda Kurd qedexa, asimilasyon hebûye, lê ta îro nikarîne pêşî li zimanê kurdî bigirin û ji îro û pê de jî wê nikaribin. Yên ku ji bo kurdî xebat kirine û dikin, divê mirov wan xelat bike".

Osman Ozçelîk: "Kurd çiqasî xwedî li zimanê xwe derkevin, ew qas dê pêş bikevin. Ziman gelan ji hev cihê dike. Loma em dibêjin zimanê me rûmeta me ye. Azadiya gelê Kurd, zimanê kurdî li pêşiya me ye. Ew roj ne dîr in."

Nivîskar Faik Bulut: "Ez nabêjim zimanê kurdî rûmeta me ye. Ez dibêjim zimanê me qedera me ye. Zimanê me tune be, qedera me jî tune ye."

Çalakî

Bi helkeftina 111 saliya rojnamegeriya Kurdî, rêxistinên **Tirbepî, Aliya, Girkê Legê û Dêrikê** yên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), ji bo xelatkirina girûpên çandî û sazûmanên mafên mirovan şevbiwêrkin li dar xistin. Şevbiwêrkan, bi rawestaneke bê deng li ser giyanên pakrewanên rojnamegeriyê, nemaze yên Kurd û Kurdistanê dest pê kirin. Di pey re, gotina Komîta Çandî hate xwendin.

Girûp û sazûmanên hatine xelatkirin ev bûn:

1. Komîta MAF. 2. Komîta DAD. 3. Koçka Cegerxwîn ya rewşenbîriya Kurdî. 4. Dîdargeha Girkê Legê. 5. Girûpa Dêrikê ya Çanda Kurdî. 6. Tevna Çand û Huner a Kurdî. 7. Baxên Jinên Dêrikê. 8. Girûpa Tirbepiyê ya Çanda Kurdî.

Piştî xelatkirinê, nûnerên girûp û sazûmanên xelatkirî, sipasiya partiya me kirin, herweha, ji bo berdewamiya kar û çalakiyên bi vî rengî, wan hevî û daxwaziyên xwe anîne zimên.